

# Ji Rojhilatê revî bo Rojavayê

»»» R:9



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd  
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siyayasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne [www.kurdistanmedia.com/kurdi](http://www.kurdistanmedia.com/kurdi)  
[www.agirimedia.org](http://www.agirimedia.org) Hejmar (421) 08-05-2022 Buha (1000) Tûmen*

## Hilbijartinên Serokatiya Fransa û çend ezmûnên nû

»»» R:3

## Rewşa xirab a mafê mirov li Îranê

»»» R:5

## Du salan piştî dagirkariya Artsaxê, Laheyê Ermenistan weke xwediyê

»»» R:7

## Herî di nav serê wî dujminî de ku hêviya wî bi girtîgehê ye

**R**oja Yekşemî rêkêvtî 11'ê Bane-mara 1401'an, di piraniya bajarên Kurdistan û Îranê de, mamosteyên xwandingehan bona nîşandana nerizayetiya xwe xwenîşandan kirin.

wan li hemberî rewşa aloz û kêrnehatî ya derbasiya xwe û herwisa şert û mercên ku li ser xwandingehan de hatine sepandin tev hatin li ser şeqaman û li pêş deriyê avahiya xwandingehên bajarên xwe an jî li pêş deriyê îdareya binav Perwerde û Hinkariyê xwe civiyan û tevî bi qîrandina siloganên mafxwaziyê ên li dijî zilm û zordariya rejîmê sekinîn û mînakê ciwan ên din ji xebata Bajar nîşan dan ku dibe weke xala verçerxana di nav tevgera rewa ya mafxwazane û azadîxwazane bibînin.

Mamosteyan xwandingehan daxwaza wan mafên xwe dikin ku ji aliyê rejîma Îranê ve hatine zeftkirin, mafên weke çareserkirina rewşa aloz a perwerdehiyê, nehêlana sîstema bi polkirina xwandinê, pêşgirtin ji xwandinê bi zimanê dayîkê ên neteweyên din ên li Îranê de û

herwisa bi şeweya pîlan danîna bo reha xwe di hûndir de kutaye, dema ku wiha ye daxwazkariyên mamosteyan tenê hinek xasî nînin ku tenê mamoste bixwe jê mifahê verbigrin belkû, cîbicî bûna daxwazkariyên wan dewsa raşterast li ser rewşa xwandinê û malbalatên wan hedibe û bi wî awayî jî dikarin bêjin ya ku îro mamoste li ser şeqaman daxwaz dikin, daxwaza piraniya ji xelkên din ên Îranê ye.

Herwisa mamosteyên xwandingehan di nerizayetiyan xwe de komek silogan qîrandin ku parek ji wan wiha ne: "Mamosteyê girtî dibe bê azad kirin, hawar hawar ji vê hemû zilm û zordariyê, mamoste biqire û daxwaza mafê bike".

Mamosteyan rolek girîng û bandordar li dîroka her neteweyekî de û herwisa li avakirina bingeha kesayetiya diruşt a tak de heye û eger gel şanaziyê bi zanayî, danayî, rewşendîrî û elît û dahênerên xwe bikin, dibe ev bizanin ku, tev ew hilkeftane berê xwandekeke mamosteyekî bûne.

Mamoste yek ji girîngtirîn texên

bingeh danîna civakê ka tendrûst û pêşkevî ne.

Di raştiyê de, girîngî dan bi vê texê, girîngî dan bi mirovahiyê ye. Lê, mixabin herçawan ku hûn dibînin kerta di Îranê de kerta perwerdehiyê di bin deşhîlata rejîma Îslamî a Îranê de ye ku ji wan kertane, bi awayek tewav hatiye piştguh xistin û bûye qurbanîyê zêdaxwaziyên rejîma zal. Qurbanîya cora nebûna corên îmkantên û cihên guncav bo xwandinê û herwisa ev givaşên ku li ser mamosteyan dixînin, em dikarin bi kurtasî di çend xalan de rêzbandî bikin:

1-Qedexbûna xwendina bi zimanê dayîkê bo neteweyên xeyrî fars.

2-Nebûna cihên guncav û standard bo xwendinê.

3-Deştîşan nekirina bûdçeya hewce bo xwandingehan.

4-Nebûn û vîdebirina birêvebir û pîsporên zana di nav xwandingehan de û bicîhê wan bi danîna kesên stûxwar û girêdayî dezgeha Wîlayet Feqî.

5-Qorxkirina berpirsariyên bilind ên birêveberiyê di xwandingehan de, ji aliyê kesên neşareza û

stûxwar.

6-Sepandina arîşeyên regezi û hizira îdeolojîk li ser xwandekeke de.

Pare hêlan an jî heta nedana heqdestê mamosteyan. Û dehan mînakên din ku di piraniya deman de ev arîşeyan dev berdana xwandekeke ji xwendinê li pey xwe hebûye ku eva dikare zirarek mezin ji paşeroja wî/ê zarokî û herwisa civakê bixîne.

Di kerta perwerdehiyê de, netenê ku ti nîrxek bi vê beşê nadin belkû, cihê mamosteyan û li serhev xemxwarên warê perwerdehiyê bûye kuncikê girtîgehê û sal nîne ku bi dehan civînan nerizayetiya li bajarên Îranê de bi taybet li Kurdistanê ji aliyê mamosteyan ve bi mebesta daxwazkariyên sinfî ên wan neyên lidarxistin û bi dehan mamoste neyên desteser kirin û li girtîgehan neyên xistin. Mînakê herî nû giravgirtina hefteya derbasbûyî bû ku di encamê de dehan mamosteyên xemxwar hatin desteser kirin anî jî gazî kirin û gef ji wan hate xwarin ku navên wiha ne:

Eskender Lutfî û Mes'ûd Nîkxwa, endamên birêveberiya

Encûmena Sinfî a Mamosteyên Kurdistan - Merîwanê ku, li dema destserkirinê heta niha dest avêtine bi gireve.

Selah Surxî endamê Encûmena Sinfî yê Mamosteyên Kurdistan-Seqiz û Zîvîye ku, tevî desteser kirina wan hinek kelopelên kesî ên wan û piştî heta dema dadgehîkirinê bi awayê demkî û bi danîna barimteyê hatine azadkirin.

Herwisa gazîkirina Xulamriza Şerîfe, mamosteyê malnîşînkirî û çalakvanê kultûrî yê bajarê Sine, ji aliyê Stada Xeberî a îdareya Îtla'ata wî bajarî ve. Gazîkirina hejmarek ji mamosteyên xwandingehên bajarê Bane, ji aliyê Elîriza Movehidî berprisê heraseta îdareya binav Barhînan a wî bajarî û gefxwarin û lêpîrsînkirina ji wan.

Ew rewşa han a hatî sepandin û nexwaz wisa jê kiriye ku, her niha mamosteyan her weke çawan çavnehîrî dikirin bi şanazî û serbilindî ve beşdarî girevan dibin û ti tîrsek ji egera desteser kirin û li girtîgehê xistinê tunînin çimkî, herçawan ev bixwe dibêjin: Herî li nav serê dijmin ku hêviya vî bi girtîgehê ye.

## Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Di heyama wan rojan de, li Îranê de desthilata tîjî ji dad, xweşderbasî, xêr û bereketê ragihandiye ku, vir şûnda alîkariyên hikûmetê ên li derheq ard û nan de namînin û êdî di bazarê dê nirxa ard û nan azad dibe.

Ev biryara rejîmê di yek şevê de nirxa ard, an, şîrînî, kêyk, makronî û bikurtasî her tişta ku peywendî bi ard ve hebe sê hember zêde kiriye û ev welatîyên ku li roja Duşemî xwarina demek ji makroniyê 20 hezar Tumen mizaxte dikirin, diviya roja Sêşemî 60 hezar Tumen mizaxte biki-rina!

Yanî li heyam kêmtir ji 24 demjmêran de nirxa nanx-warîne ji sedî 300 bilind bûye!

Hefteyek berê, li ser sînûrê bajarê Newsûdê li Kurdis-tanê, hêzên serkutker ên rejîma cemarana koloniyalîst, destdirêjiyek serberedayî li dijî girûpek ji kolberên Kurd encam dan û di vê destdirêjiyê de çendîn kes ji kolberên Kurd hatin kuştin û birîndarkirin, dehan malbat xembar kirine, koma malbatên ku heya vê roja ku bo carek ji xwarina makroniyê, perê 20 hezar Tumenî ên makroniyê jî tunebûn, hefteya piştire demaku makronî û nan ji sedî 300 nirxa vê bilind bûye û serpereştê malê an dabînerê nanê mala wan jî, di jiyanê de nemaye heta ku parek ji sê carên xwarina rojane ji wan re dabîn bike!

Her hefteyek berî vê dest-dirêjiyê, li Zanîstgeha Îlim û Sene`ita Tehranê ku kevtirîn

## Bê nan û azadî



Danişseraya Îranê ye û piştire bûye bi zanîstgeh û ciwanên xelkê dibe vir hînî zanîsta îroyîn bên kirin, hêzên Herasetê ji xwandekaran re rê nedane da ku herin zanîngehê, çimkû hinek ji rûyê dest û porên wan diyar bûye!

Ev arîşeyên han piçûktirîn mînakên vê siyaseta gendel û wêranker a rejîma Xomênî û Xam-neyne ku silogan diqîriyan, dê xelkê Îranê bigînin bi meqamê mirovahiyê.

Lê, netenê ku ev negihandin bi meqamê mirovahiyê, ev meqamê ku renge heta qasekî li devra Pehlevî de ji wan re mabû, dehan pileyan anîne xwartir jî.

Li cîhanê de sîstemên siyasî du îdiayên wan hene, hinek ji wan ku îdî`a dikin, cem wan azadiya tak û mirovan girîngitire û ew yasayê li ser esasê azadiya mirovan dadirêjin, êdî ev mirova dibe bi azadî lê, li ser şansê xwe jiyana xwe birêve bibe, ên wisa jî hene ku îdî`aya vê dikin ku dix-wazin dadperweriya civakî dabîn bikin û dibêjin mirov nan hebû azadî jî bi dest tê.

Lê, îdeolojiya dije mirovî ya Wilayeta Feqî, li derveyî wan sîsteman de ye û tenê mînak Koreya Bakur û Somalî ye ku wekî wê rejîmê hene, ew hem xelkê birçî dikin û hem jî azadiyê ji xelkê diştînin û herçiqas serweta welat jî heye bona çekirina mûşekan mizaxte dikin, çawaniya aza-diyê ji xelkê standine, ji wan ditirsin û ji vehşeta herfînê de ev wisa dizanin ku çekên giran wan diparêzin, her bi vê sedemê ye jî bi hêsanî destdirêjî li ser xelkê dikin û nanê wan jî qut dikin da ku, mizaxteya mûşekên xwe derbixînin.

Di Îrana wêran de, ne nan heye û ne jî azadî.





## Hilbijartinên Serokatiya Fransa û çend ezmûnên nû



N :Azad Kurdî

Çîroka û senariyoya sala 2017'an a hilbijartinên Sero-  
komariya Fransa di 2022'an  
de dubare bû. Heman berbijêr  
û rikeber ketin kêbirkêya hil-  
bijartinan a Serokkomariya  
Fransa bo 5 salên din. Encam  
jî bi heman awayî derketin.

Emmanuel Macron vê carê bi  
bidestxistina 58.5 %, li hem-  
ber Marine Le Pen bi 41.5 %  
a dangan bi ser ket û bo dema  
5 salên pêş dê Serokkomariya  
Fransa bike ligel gelek lêger  
û astengan. Emê bi kurtî balê  
bikşînin ser wan ezmûnên nû  
ku di encama hilbijartinên  
yekşema borî li Fransa derke-  
tin holê :

-Rojeva Fransa bo kurdan  
giring e, ji ber ku Fransa di  
50 salên borî de dost û hev-  
areke baş bûye bo tevgera  
Kurdan li hemû parçeyên  
Kurdistana dabeşkirî de. Ev  
peywendî berhema ked û hûr-  
bîniya Dr. Qasimloyê şehîd  
e ku bi bernameye neteweyî  
ya kurdane, şîratêjîk û girîng  
bala siyasetvanên girîng  
ên Fransî ber bi pîrsa kurd  
rakîsand, li gor daxuyani-  
yên karbidest û kesayetiyên  
Fransî bi xwe, dostîniya wan  
ligel kurdan vedigere ser  
peywendiyên wan ligel Dr.  
Qasimloyê rêber.

-Mediya û çapemeniya  
cîhanê vê carê girîngiyeke  
taybet da hilbijartinên se-  
rokkomariya Fransa, ji ber  
ku fransî ketin navbera du  
hilbijartinan de : 1. Mayîn û  
berdewambûn ligel Ewropa,  
Nato û çarçoveya welatên  
Euro û « Schengen », 2.  
Guhertinên navxweyî û dest-  
pêkirina pîrsgrîrêkên micid li  
navxweyê Fransa ku zêdetir  
Marine Le Pen dixwest bike,  
bi taybet li dijî biyaniyan  
û civaka Misilman û di vê  
navberê de jî pitir li dijî sem-  
bolên hêz û grupên turndajo  
yên misilmanan li Fransa.



Di encamê de, bi encameke  
ne zêde, fransiyan Macron  
hilbijartin da ku hizr û pro-  
jeyên Marine Le Pen nehên  
cîbicîkirin û Fransa ji civaka  
cîhanî û hevpeymanên xwe  
dûr nekeve.

-Ligel ku Marine Le Pen  
seroka partiya 'Rassemble-  
ment National' anku Civata  
Neteweyî raştî tîkçûneke  
din hat, lê li gor hilbijartinên  
2017'an de, pêşketinên ber-  
çav bidest xistin û li gelek  
herêma û bajarên girîng  
dengên zêde bidest xistin û ji  
xwe re serkevtin hesivandin.

Ev yek bû sedema nigeraniya  
civaka Fransî û Ewropiyan  
bi giştî. Partiya Parine Le  
Pen her zû piştî ragehan-  
dina encamên hilbijartinan,  
eniya opozîsyonê hilbijart û  
dixweze bi rakîsandina çend  
partiyên nerazî û dijberî Em-  
manuel Macron, astengên  
micid li ser rêya kabîneya nû  
ya Macron çê bike di 5 salên  
pêş de.

-Emmanuel Macron serok  
û damezrînerê partiya 'La  
République en marche' anku  
Komara li ser tevgerê , li  
sala 2016'an ava kir û karî di  
sala 2017'an de hemû rike-  
berên xwe ên kilasîk raştî  
tîkçûnê bîne û wekî kesekî  
genc ket kêbirkêya hilbijar-  
tinan ligel Marine Le Pen û  
di encam de jî ser ket. Ma-  
cron di 5 salên borî de li asta  
navxwe ya Fransa de ligel  
çendîn asteng û pîrsgrîrêkên

navxweyî rûbirû bû ku ya  
herî berçav tevgera 'êlekên  
zer' bû ku pîr hikûmeta wî  
aciz kir.

Nerazîbûneke berfireh ku  
fransiyan ji wî û kabîneya  
wî hene ev e ku navborî  
çî xizmet bo kesên kê-  
dahat nekirin û xizmetên  
kerta tendurîstiyê bê çare-  
serî man û bona pîrsgrîrêka  
bêkariyê kêmtir hewil da û  
... Ji hemûyan girîngtir jî  
nexweşiya COVID -19 hate  
ser.

Dijberên wî partiyên raştgir  
in ku Marine Le Pen û Eric  
Zemmour serkêşiya wan  
dikin û her du jî rikeberên  
Macron bûn di hilbijartinên  
îsal de. Neraziyên wî jî par-  
tiyên çep û keskan bûn ku  
li dijî bernameyên wî bûn û  
dibêjin Macron hemû xizmet  
bo zengîn û dewlemendan  
kirin û qatên din ji bîr kirin û  
xizmetên civakî kêmtir kirin.

-Partiya Sosyalîst a Fransa ku  
yek ji partiyên herî xurt di ro-  
jeva siyasî bû li vî welatî, li-  
gel çendîn cudabûnan rûbirû  
hat û ger bi ger lawaztir bû.

Di hilbijartinên vê gerê de  
dengên herî kêmtir xistin  
û weke tîkçûneke dîrokî hati-  
ye dîtin bo rêveberên vê par-  
tiyê. Ev pêvajo ligel qonaxa  
Serokatiya François Hollande  
dest pe kir. Bi heman awayî  
jî partiya Komarîxwazan ku  
partiyeke kilasîk a Fransa bû,  
raştî tîkçûneke ecêb hat.

-Lê Partiya çepgir a tundajo  
'La France insoumise' anko  
Farnsa serhil dide, bi sero-  
katiya Jean-Luc Mélançon  
ku sala 2016'an hatiye ava-  
kirin, weke siyasetvanekî bi  
ezmûn karî zêdetirîn dengên  
çepên Fransa bi xwe tomar  
bike û şîya di hilbijartinên  
2022'an de, 21.95 ji sedî ya  
dangan bixwe. Deng-  
derên wan zêde kesên kal û  
bi temen bûn.

-Şirovekarên siyasî yên  
Fransî bawer in ku divê  
Macron guhertinan di ber-  
name û projeyên xwe de pêk  
bîne bo navxweyê Fransa û  
weke berê siyasetê nemeşîne,  
pêwîst e hemû dengên ner-  
azî guhdarî bike, ger na di 5  
salên pêş de dê ligel asteng û  
lêgerên micid rûbirû bibe. Di  
rojên pêşiya me de Macron  
dê Serokwezîr û kabîneya  
nû diyarî bike û hêj ne xuya  
ye dê bi kîjan partiyan re  
hikûmetê pêk bîne.

Karê Macron ne hêsan e, ji  
ber ku razîkirina dijberarên  
rasgirt ne mumkin e û wan  
ji niha ve eniya opozîsi-  
yonê hilbijartine, herwiha  
razîkirina neraziyên çep jî  
serêşîyeke ji vê kêmtir nine.

Ev yek hemû bedewiya de-  
mokrasiya rasteqîne ye ku  
li Fransa û welatên xwedî  
bingehên demokratîk heye,  
berevajî welatên Rojhilata  
Navîn ku bi derdê nebûna  
sîstemên demokratîk û ne  
azad û dîktatûr de dinalînin.



## Edebiyat û Rewşenbîr

N:Lokman Polat

Edebiyat bingeha xwe ji zanînê digre. Ji xwe bê zanîn edebiyat nabe. Koka edebiyatê zanîne û edebiyat li ser vê koka zanînê şîn dibe. Nivîskarên edebî di gelek waran de zanane û xwediye asoyeke firehin. Ew bi qasê ku dinivîsin sed qasê wê jî dixwînin.

Zanîn, zanatî, insanên zana di pêvajoya dîrokê de roleke girîng leyiştine. Edebiyatvan û rewşenbîr di her demî de bûne wijdana gelê xwe, bûne peyivdarên gel. Her tim li dij neheqiyê derketine. Ji bo wê jî, di hemî demî de serê wan bi deşhilatdarên dewletê re ketiye teşxelê. Rewşenbîr û nivîskar, hatine kuştin, hatine girtin, tehdâ dîtine, lêdan xwarine, lê ji dîtin û ramanên xwe venegeriyane, ji deşhilatdarê sazûmanê re serî netewandine.

Însan û Siyaset

Kirdarê dîrokê însan e. Însan nebe dîrok nabe. Dîrok berhema çalakiya insanan e. Yê ku dîrokê pêk tîne û dinivîse însan e. Însan digehure û digehurîne. Guherandin pêvajoya xas ya insanan e.

Dijminê insaniyetê yê herî mezin nezanîn e, anku cehalet e. Feydeya insanên nezan nagihîşe civakê. Mirovên nezan bi hal û hareketên xwe hem zirarê didin xwe û hem jî zirarê didin civakê. Kolonyalîst, dagirker, welatên ku dagir dikin, insanên wî welatî jî nezan dihêlin. Ew naxwazin insanên welatên bindest hişyar bibin. Ji bo li pêşîya siyasêtbûna mirovan bigirin aştengan derdixin pêşberên wan. Lewra ew dizanin mirovên siyasî dibin belayê serê wan. Kolonyalîst dixwazin li gor qalibeke, yanê li gorê pîvanên xwe sexsiyeta mirovan bifafrînin. Ev sexsiyet sexsiyeteke ji hêla siyasî ve gelek paştamayî, nezan û tîpekî tirsonek e. Ev tîp insan -evet efendîmcî – Ezbenî-, -Emret komutanîmcî - Fer-man bike qomutanîm- û

-Baş uştine - Li ser çavan- ji xwe re kirine şeweya jiyanê. Dewletên dagirker dixwaze bi mirovên weha şikil bide civakê. Lewra civakekê ku ji mirovên tirsonek, menfeet-pereşt, ji xwe bê bawer pêk bê pir hêsantir tê îdare kirin.

Dewletên Dîktatorî

Di rojhelata navîn de Kemalîzm, Partiya Baas, Îslamîya siyasî, Fundementaliştî, Xumeynîstî, dixwaze yek tîp mirov bifafrîne. Li ser esasê Kemalîzmê, Baasê û Fundementalizmê (Her wekî Xizbûllah û Talîban) dewletên ku hatine pêkanîn tu eleqeya wan bi demokrasîyê ve tune. Dewletên dîktatorîne û loma jî her tim dixwazin civakê li gorê pîvanên leşkerî, li gorê kultura mîlîtarîzmê perwerde bikin, mejiyên wan tevlihev bikin, wan têxin nav jiyanê leşkergehî. Bi vê şeweyî civakê di nav mehsereyek de hepis bikin, wan wek haceta mekîna guvaştinê pêk binin. Mentalîteya van dewletên dîktatorî her tim şer dixwaze, bi şerên neheq, bi êrişên barbarî civakê ber bi felaketê ve dibin, şarezaiya rojhilata navîn dixin nav xeterê.

Kurd û Demokrasî

Di nav civaka kurdan de kultura nûjen/modern û ramanên demokrasîyê heger ewqas pêşve neçûye sedemên wê di serî de ew welatên ku cîranên kurdanin û di nav pêvajoya dîrokê de Kurdistanê di nav xwe de perçe kirine, ew bûne sedem ku civaka kurd pêşve neçe. Lê dîsa jî dema mirov li kurdan û li gelên cîranên wan dinêre, kurd ji cîranên xwe bêtir siyasîne, demokrat in, humanîst in, civaknas in, sosyal civakî ne.

Di nav civaka kurd de pêşveçûna ramanên demokratîk bi sancî dibe, lê di pêvajoyê de her diçe pêşveçûyîn heye. Li gor bîrûbawerîya min demokrasîya ku di nav civaka kurd de pêk bê, dê ji ya hemû welatên rojhilata navîn pêşdetir be. Kurdistanê başûr di vê rê de gaveke, û ez hêvî dikim ku ev gav hîn jî pêşve biçe û diçe jî.

Ji salên 1960î ta niha di Kurdistanê de insanên xas yên politîk her diçe zêde dibin. Zêdebûyîna insanên politîk ji bo doza kurdan tişteke pozîtîf e. Hişyarî û heşmendariya politîk ya civaka kurd ji bo berdewamkirina doza netewa kurd pêwîst e. Hebûna siyasêtmedarên kurd, kar û xebatên wan, pêkanîna tevgerê demokratîk û damezrandina partiyên demokratîk û neteweyî, di qada navnetewî de doza kurd germ digre, jîndar dike. Temînata doza têkoşîna netewa kurd, kurdên siyasî, tevgera demokratîk, partî û rêxistinên netewî û demokratîk, komele û dezgehên çandî û girseyî en netewa kurd bi xwe ne. Lê divê siyasêt bi zanabûn bê kirin. Bi heşt û giyanên kurd û Kurdistanê bê meşandin.

Di meşandina siyasêtê de rewşenbîrên siyasî serî dikşînin. Ew roleke pêşewatiyê dilîzin. Ne tenê di karê siyasî de, di kar û xebata çandî, edebî, lêkolînî û hwd, di gelek waran de rewşenbîr tim li pêşin. Rewşenbîrê her mîletî/neteweyî ji nava civaka wî mîletî derketine û bûne wijdana civakê, bûne peyivdarên civakê. Pîrs û pîrsgirêkên civakî û netewî hanîne zimên. Li hemberê bûyeran reaksiyon nîşan dane, li hemberê zilm û tehdâ dagirkeriyê têkoşiyane. Însiyatîf pêkanîne, helwestên baş nîşan dane.

Xisûsiyeta Rewşenbîrîyê

Xisûsiyeta rewşenbîrîyê eve ku mirovên azadîxwazin. Asoyê wan fireh e, dîtin û ramanên azad diparêzin. Rewşenbîrêkî bi fizîkî êsîr/dîl be jî bi ruh, bi bîr û bawerî, bi fikr û raman azad e. Helwesta wî rasteqînî ye, rexnegirî ye. Rexnegirîya wî ji bo berjewendîyên doza netewî, civakî, paraştina heq û hiqûqa insanan e, paraştina pîr rengî û pîr dengîtîyê ye.

Di welatên bindest de, wezîfeyên rewşenbîran pîralîye. Berpirsiyariya wan ya netewî û civakî heye. Ew mecbûrin ku bibin şîrîkê derdê gelê xwe. Pîrs û pîrsgirêkên netewayî, problemên gelêrî tînin zimên. Ji bo çareserîya probleman

xwediye pêşniyazanin. Ji civakê re rê nîşan didin. Di nav têkoşîna civakî û netewî de cîh digrin. Ji xwe dema mirov li komîteyên navendî yên rêxistinên siyasî dinêre, li serok û sekreterên partiyên siyasî dinêre hemû jî mirovên rewşenbîr in. Ji xwe heger insanek rewşenbîr nebe, di hêla siyasî de zanîst nebe nikare siyasêtê bi rê ve bibe, teoriya îdeolojiya siyaseta xwe pêk bîne.

Gelek rewşenbîrên siyasêtmedar di gel siyasêtê gelek karên hêja yên çandî, edebî jî dikin. Berhemên edebî diafirînin, lêkolînên civakî dikin, dîtin û ramanên teorîk pêk tînin. Kar û xebata entelektuelî dikin. Kar û xebatên weha pîralî pêşveçûna civakî bi lez dixê.

Helwesta rewşenbîrî Di nav civakê de wezîfe û berpirsiyariya rewşenbîran gelek e. Ji bo pêkanîna berpirsiyariya rewşenbîrî, helwest girtin pêwîst e. Helwesta rewşenbîrî divê di serî de li ser bingeha azadiya fikrî, ramanî be. Parêştina azadiya fikrî helwestekî prensîbî ye. Tersê vê tevgerandî, hareketkirin ji sexsiyeta rewşenbîrî re deşt nade. Sexsiyeta rewşenbîrî azad fikrandî û azad hareketkirin e. Ew li gorê emir û fermanan hareket nake û divê neke jî.

Sexsiyeta rewşenbîrî xizmeta gel û welatê xwe de her tim amade ye. Lê ew ji deşhilatdariya dagirkeran re, ji partiyên nedemokratîk re, ji kesên dîktator re tu car xizmet nake û divê neke jî. Sexsiyeta rewşenbîrî bi Xwedayên siyasî bawer nake û li hemberê wan helwest werdigre.

Rewşenbîrî hêsan nîn e. Herkes nikare bibe reşenbîr. Îsanek dibe ku siyasêtvan be, nivîskar be, mamoşe be, zimanzan be, lê nayê wê maneyê ku ew rewşenbîr e. Divê were zanîn ku her nivîskar rewşenbîr nîn e. Çawa ku her rewşenbîr nivîskar nîn e, nayê wê maneyê ku her nivîskar, her kesê ku çîrok, roman û helbest dinivîse rewşenbîr e. Hinek kes/kesayetî hene ku yek pirtûkek jî nenivîsîne lê rewşenbîr in.




## Rewşa xirab a mafê mirov li Îranê



N:Zahêd Esedî

Rewşa xirab ya mafên mirov li Îranê, çavdêrîkirin, dest-biserî û binçavkirinên nerewa û neyasayî yên rojnamevan û çalakên mafên mirov û darvekirin û eşkence kirin û bêdadiyên civakî, roj li pey rojê zêdetir dibe û cîhan jî li hemberî wan hemî zilm û bêdadiyan de, çavê xwe miqandîye û bédeng in. bédengkirina rojnamevan û rexnegiran nahê qebûlîkirin, kiryarên han xisarê ji guftigoyên giştî digehîne û xelkê Îran û cîhanê ji zaniyariyên girîng lid or raştî û realîteya wî welatî bêpar dihêle. Li gor raporên saziyên navdewletî di Îrana bi siya rejîma komara Îslamî de rojnamevan destbiser yan jî dikevine bin çavdêriyê û piraniya wan bi tometên weke “têkilî bi medyayên biyanî, piropaganda li dijî rejîma Îranê, rexneyên tund ji rêberên rejîmê û gotûbêj li ser pirsên heştiyar ên siyasî” dikewine jêr çavdêriyê. Îran bi dom kirina siyaseta tepeser kirnê û bi kar anîna zêde a zext û guwaşê li derheq çalakvanên siyasî di kurdiştana Îranê û herêmên din ê Îranê kû Netewên ne Faris têde dijîn, dibete pêş.

Kurd, Erebi, Belûç, Turkmen, Azerî û kêmanîyên Olî wek Cihû, Kirîştîyan, Yarsan û Zerdeştî di Îranê de li gel tepeserîyê rûbirûne û ji alîyê hêzên Komara Îslamîya Îranê rojane di gel zaxt û guwaşê rûbirûne. her wisa girtin û zîndanî kirina Çalakvanên siyasî û cûda hizran li Îranê zêde bûye. Hûkmê li sêdare danê bi berdewamî li ser çalakvanên Kurd tê sepan-din. Hereşe li ser çalakvanên Kurd, Erebi û Belûç û her wisa Nivîskaran, Rojnamevanan, Derhêneran, Çalakvanên



Sazîyên Sivîl û berevanên Mafê Mirov tişteki rojane ye. serbarî wan hemû zext û tepeser kirinê, bi deyan girtîyên Siyasî yên Kurd hûkimê li darvekirinê bi ser wande hatîye sepan-din. Kû piraniyan bi sûçê dijberî di gel Xwedê (Moharibe) hatine mehkûm kirin û ewa di çaxekê deye kû xebatên wan zêdetir dijberî li gel zext û guwaşê derheq bi gelê Kurd bûye. Rejîma Îslamîya Îranê berdewam benda 188a Yasaya xwe dij bi hevadar, endamên Partiyên Kurdî bikar dine û bi wî awayî wan bi Kafir li qelem dide, kû sizayê tawana han di Îranê de darvekirine. jordeçûna rêjeya îdaman li Îranê di midehê çend heftiyênana derbasbûyî car din nîgeraniyek berfireh li aştî navxweyî û derweyî de li pey xwe anî. birêvebirina hukmê îdamê li ber çavê xelkê û cihên giştî de, bandorek nerênî li ser hevvelatiyan û goriyan dike. zafbûna hejmara îdaman û xurtbûna seqa û atmosfera tund a ewlehî- yasayî ku çalakên sivîl, mafê mirov û siyasî bi givaş û metirsiyan re berbirû dike, eyankerê wê ye ku rewşa mafê mirov li Îran roj li pey rojê xirabtir dibe. Rejîma Îranê piştî welatê Çînê, pileya duyem di warê îdamkirina hevvelatiyan di aştî cîhanê de heye. rêjeyek ku wusa kiriye çalakên mafê mirov bi berdewamî nîgeraniyên xwe li vê derheqê de bînin ziman.

Lê mixabin dikarim bêjim ku bînpê kirina mafê mirov û bêdadî û zilm û zordarî li Îranê bi giştî û li Kurdiştanê bi taybetî her roj zêdetir û bi şidetir dibe. Cuda ji bînpêkirina mafê mirov li kurdiştanê, rewşa abûrî ya xelkê jî pir xirab e û xelik bi hejarî û nedariyek bê mînak re berbirûne. Bêkarî û nebûna delîveyên karî, jêhelçûna diyardeyên civakî, xwekujî, bê hîvîti li jîyan û paşerojek geş re, bi talan birina serwet û çavkaniyên bin erd yên axa kurdiştanê, kuştina kulberan, kuştin û îdamkirin û eşkence kirin û binçavkirina xurtên Kurdiştanê bi hincetên cur bi cur her roj zêde dibe.

Lê hemî ew zilm û zordarî û tepeserkarî û şidetên ewlehî û milîtarîzekirina Kurdiştanê, nekariye pêşiya îradeya azadîxwazî û mafxwazî a xelkê Kurdiştanê bigre û xebat û berxudana xelkê îranê bi giştî û nemaze xelkê Kurdiştanê roj li pey rojê bi gortir û xurtir dibe. Zêdetir ji çil salan e ku rejîm bi hemî avayekî hovane xelkê wî wilatî tepeser dike lê tu carî nekarî pêşiya şîpela îradeya şoreşvanî û mafxwazî a wî gelî bisekinîne. Hewara azadîxwazî û mafxwaziyê li Îranê bilind û bilindtir dibe.





# Krîza mezin a bêkariyê



**N: Bêhzad Qadirî**

**W: Hesên Mukerem**

Di vê cîhanê de mirov hewcehiyên cur bi cur hene. Mirov bona gihîştin bi hewcehiyên destpêkî ên xwe, di pileya yekem de hewcehi bi encamdana kar e û dibe di xebata li dijî sirûştê, wate kar beşdar bibe, bi qasekî ku dibe zalbûna wî/ê li ser sirûştê zêdetir bibe û herwisa gihîştina wî/ê bo hewcehiyên destpêkî jî zêdetir dibe.

Hewcehiyên mirov sê deşte ne ku wiha ne:

1- Hewcehiyên fîzyolojîk ên weke xwarin, kinc, avahî û ... hwd.

2- Hewcehiyên derûnî ên weke, hebûna peywendîya digel kesên din, hezkirina kesên din, hezkirina ji aliyê kesên din û ... hwd.

3- Hewcehiyên civakî ên weke, azadî, mafê diyarîkirina çarenivîsê, wekhevî û ... hwd.

Mirov dibe kar bike, eger wiha nebe nekare jiyan bike.

Bêkarî yek ji sereketirîn pirs û arîşeyên welatên li halê pêşkevî de ye ku, rêkarên kurtmayî û xwedîkar nikarin berpirsyar bin.

Di welatên li halê vegeşînê de, sedema bêkariyê bo pêkhateya aborî, civakî û kultûrî ên vê civakê vediger e.

Domahiya bêkariyê li welatên wiha de bi awayek berdewam berfirehtir dibe û di asteke de ye ku beşeke berçav ji derçoyên zanîngehê jî ji xwe digire.

Di pênase kirina bêkariyê de dikarin bêjin ku: Berdewam



nebûna li ser kar û pêşeyek an destpêranegihîştina tak bi kar û pêşeyekî, watetak tev ev taybetmendiyên karkirinê li hûndirî de heye lê, karek jêra peyda nabe.

Hinek şert û merc hene ku, bi dîtina wan di takekê de dikarin bêjin ku ev tak li rêza bêkaran de ye:

1- Eger tak şiyana encamdana karekî hebe.

2- Eger tak li pey kar bigere û ti karek deşt wî/ê nekeve.

**Corên bêkariyê**

Bêkarî pêkhateyeke, ev cora bêkariyê bi sedema vegeşîna di hinek çalakîyên niha ên wan di aboriya welatê de gorê û li ser kaletîvê hilbijartina şarezayan bandorê dadinê.

Bêkariya jihev xweşandin, Ev cora bêkariyê ji aliyê berdewambûna kêma di navbera wezîfedarên li herêman û pişeyên cuda û bi sedema guhertinên aboriya niştîman pêk tên.

Bêkariya sirûştî, Dibe di navbera derxistin û daxwazkirin, wate bo lêzanan

hevsengiya hebûnê hebe. Bêkariya herêmi, Di vê şewaza bêkariyê de, rewşa aborî li hinek pişeyên herêman de ber bi aliyê xerabiyê ve diçe.

Bêkariya demsalî, hinek ji çalakîyên aborî demsalî ne ên weke: Cotyarî, geştyarî û ... hwd.

Bêkariya çavkanî vergirtî ji hejariyê, mirovên ku pereyê hewce bona sermayedanîna tunînin, girêdayî şewazên han ên bêkariyê ne. Bêkariya eşkere, Ev şewaza bêkariyê bi vê wateyê ye, mirovên ku nikarin karên guncav digel rewş û pisporiya xwe peyda bikin.

Bêkariya veşartî, hilbijartina mirovên lawaz bo kar û koma pişeyên ku ti qazancek ji wan re tune, bêkariya helsekevî jî jê re dibêjin.

Bêkariya aşteng û arîşeyên civakî û kom bandorên neyînî li ser tak û civakê dadinê.

Em nikarin rêjeya wan kesên ku bêkarin diyar bikin û ev babeta pêka navendên weke gund û bajar, regez, şewaza perwedehiyê û herwisa aşt

dersgotinên li cihên cuda digel yektir cuda ne.

Rapora demsalî ya amara rejîma Îranê nîşan dide ku, li demsala Havîna sala 1400'an, rêjeya bêkariyê bi bilindbûna ji sedî 8 liçav demsala Biharê, gihîştîye ji sedî 6.9, li kêlega de vê yekê jî, rêjeya mejûlbûna bi kar li Îranê de, bitaybet dinav jinan de gelek kêma li heyama berfirehbûna nexweşiya Koronayê.

Pêka vê raporê, li demsala Havîna îsal de, 23 milyon û 404 hezar kes li Îranê li ser kar bûne ku ev rêjeya 136 hezar kes li demsala Havîna sala derbasbûyî de Yek milyon û 346 hezar kes jî li demsala Havîna 1398'an kêmtir bûye. Di vê navberê de jinan zêdetirîn daktina ji hêla karber ketiye.

Hêjayê basê ye ku, amarên vê navendê ji aliyê rejîmê ve bi awayekî sistematîk tê deştîkirin û ya ku zelal û eşkereye ev e ku di Îranê de bêkarî bûye bi mezintirîn kirîz û tev çîn û qadên civakê girtiye, û di encamê de bûye sedema biheder çûna samana hizirê û mirovan li civakê de.

## Nerîna Lîderan



“Tony Blair”:

“Dibe nato di şerê Urkraynê de tedaxolê bike.”



“Soylu”:

“Kiliçdaroglu dixwaze em ji Efrînê derkevin.”



“Şaxewan Ebdullah”:

“Têkilîyên Bexda û Hewlêrê baş e, lê Dadgeha Federal Pirsgrîkan derdixîne.”



Ebû Torabî:

“Êş û azarên aborî ên îro, encama siyasîyên şaş ên dehkên derbasbûyî ne.”

## Du salan piştî dagirkariya Artsaxê, Laheyê Ermenîstan weke xwediyê mîratên çandî yên Artsaxê binav kir



N: Eskender Ceiferî

Berî du salan Artêşa Tirkîyê derbasî Artsaxê bû û hêzên Azerbaycanê jî bi alîkariya Tirkîyê ku hêzeke Natoyê ye, karî dest danî ser Artsaxê. Niha piştî du salan di ser dagirkariya Artsaxê re, Dadgeha Navdewletî ya Lahe ragihand ku Ermenîstan xwedîya tevahiya mîratên çandî li Artsaxê ye.

Tê gotin Artsax ku piraniya heşîmeta wê Ermenî bû, bi piştevaniya Ermenîstanê hatibû avakirin.

Nagorno Qerebax an Qerebaxa Jorîn an jî Komara Qerebaxa Çiyayî, wek Artsax jî tê naskirin, dewletek bû ku di asta nevnetewî de bi fermî nedihat naskirin. Li gor saziya Neteweyên Yekbûyî, ewder, perçeyek ji axa Azerbaycanê ye. Lê di rastî de ewder wek dewleta DEFAC-TO ji Azerbaycanê veqetiya bû. Komara Nagorno Qerebaxê li başûr rojavaya Azerbaycanê ye. Ew li rojhelat bi Azerbaycanê re û li rojava jî bi Ermenîstanê re hevsînor e.

Ji danezanîna serxwebûna di 1991an vir ve, zimanê fermî yê Qerebaxê, Ermenî ye. Tevî ku heşîmeta herî zêde ya vê navçeyê Ermenî ye û hinek Kurd jî li wir dijîn, lê di rastî de ne kesek piştî Kurdan digire ku ew li wir bibin xwedî maf û ne jî kesek bi eşkere piştî Ermenîyan digire. Saziya Neteweyên Yekbûyî ku weke saziya ji bo parastina mafên neteweyan tê binavkirin, ji bo parastina mafê Ermenîyan li wir tev nagere.

Rast e li wir şerê Kurdan nayê kirin lê belê şerê Ermenîyan û hemû wan pêkhat-eyan tê kirin ku li dijî serdestiya Azerbaycanê li wir tev digerin. Mijar kûr dibe û Tirkîyê bi awayekî eşkere ragihand ku

ewê li hemberî Ermenîstanê di eniya Azerbaycanê de bin heya tevahiya navçeyan ji destê Ermenîstanê yan jî wê dewletê derxînin ku tenê Ermenîstan li piştî wê ye. Li gor serjimêriya herî dawî ya Ermenîstanê ku sala 2011'an hatiye encamdan, li vî welatî bi giştî nêzîkî 38 hezar Kurdan dijîn ku ji 35 hezar kes ji wan re Êzîdî tê gotin û ew 3 hezar kesên din jî wek Kurd hatine binavkirin.

Helbet tê gotin ku Ermenîstan jî qet li mafên Kurdan mikur nehatiye. Lê belê di vê navberê de pirtirbûna heşîmeta Ermenîyan li wê navçeyê, nîşan dide ku ew navçe, mafê Ermenîyan e. Ji xeynî hin gund û navçeyên biçûk ên Azerîyan, lê belê navçeyên din hemû yan jî piranî Ermenî ne. Li Azerbaycanê jî ji Kurdan re tê gotin Azerî. Li wir qet zimanê Kurdî bi fermî nehatiye naskirin. Di vê navberê de hin welat jî hebûn ku dixwaştin rewşê aram bikin. Wezîrê derve yê wê demê yê Amerîkayê Mike Pompeo ji rojnamevanan re ragehand, ku çekdarên Sûrî ji Lîbya re hatine veguheştin û ew bûye sedemê alozî, şer û kuştinên zêdetir. Mike Pompeo Tirkîye hişyar kir û ragehand, şandina çekdarên Sûrî bo şerê navbera Ermenîstan û Azerbaycanê heman alozî û şer û kuştinên li Lîbyayê dê li wê navçeyê jî dubare bike.

Lê tevî van gotinan jî Artsax hate dagirkirin.

Wê demê Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ragehand, hejmara çekdarên Sûrî li Azerbaycanê geheştîye 850 çekdaran û bendewarî hene hejmerekî zêdetir a çekdaran ji aliyê Tirkîyê ve bîn şandin. Di şerê Azerbaycan û Ermenîstanê de bi dehan çekdarên Sûrî yên ku Tirkîyê ew şandine şerê Ermenîstanê, hatin kuştin.

Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirov ragihand, di 48 demjimêrên borî de, 36 çekdarên Sûrî yên ku Tirkîyê ew şandine eniya şer, hatine kuştin û bi dehan jî birîndar bûne.

Wê saziya sivîl da zanîn, bi giştî heta niha 64 çekdarên Sûrî li Qerebaxê hatine kuştin.

Tirkîye ku di şerê Qerebaxê de piştevaniya Azerbaycanê kir hejmerek ji çekdarên opozîsyona Sûriyê tevî wî şerî kirin. Li gor zanayriyên Rewangehê, Tirkîyê 1200 çekdarên Sûrî şandibûn şerê Qerebaxê.

Hevdem serokwezîrê Ermenîstanê Nikol Pashinyan bang li civata navnetewî kir, da ku piştî rast bibin ku Tirkîye destê xwe nexwe nava nakokiyên di navbera wan û Azerbaycanê da li ser herêma Nagorno – Qarabaxê.

Lê kesî li hemberî Natoyê piştî wan negirt.

Tevî wê jî, ev biryara niha ya Dadgeha Lahe ji bo piştevaniya Ermenîstanê pir girîng e.

Ev hişdarî ya ji aliyê Serok hikûmetê Ermenîstanê ve di wî çaxî da hat, dema ku serê sibeya Yekşemê şer di navbera Ermenîstanê û Azerbaycanê da derketî û Tirkîyê piştevaniya xwe bo Azerbaycanê diyar kirî.

Balyozê Ermenîstanê li Moskowayê Fardan Taganyan jî, ji ajansa Sputnikê ya Rûsyayê re axivî û da zanîn Tirkîye 4 hezar komên çekdar ê Sûriyê bo şer li dijî Ermenîstanê bikin bo bereyên şer ê Azerbaycan û Ermenîstanê şandine.

Herwiha Fardan Taganyan tekez jî kiribû ku Tirkîye wan komên tûndrew ê Sûriyê perwerde kirine û dixwaze wan di şerê li dijî Ermenîstanê de bikarbîne.

Îranê helwesteke cuda hebû û tenê xwaşt berjewendiyên wê paraştî bin. Berdevkê Wezaretê Derve yê Îranê yê wê demê Seîd Xetîbzade ragihand ew ketina topên hawênan bo ser sînorên xwe qebûl nakin.

Wê demê di kongreyeke rojnemevanî de Seîd Xetîbzade aşkere kir wan bo bi dawîbûna qeyrana Qerebaxê û bi dawîbûna şerê Azerbaycan û Ermenîstanê projeyek amade kiriye û di demeke nêzîk de wê Îran hem ligel herdu welatan û hem jî ligel welatên herêmê dest bi danûstendinê bike.



## Kinyaz Îbrahîm Mîrozeyv



N: Ebdûlazîz Qasim

Heger em dîroka xwe baş binivîsin, pêdivî heye ku em rola kurdên Qefqasiya bi tîp zêrîn di nav rûpelên dîroka kurdî de binivîsin, ji ber rola mezin ya kurdên “Soviyeta berê” ji bo hişyarkirina heşt û pêşxistina aqilmandiya neteweyî ya kurdî bi taybetî xizmeta wan ya herî mezin li hemerî paştina ziman û edebiyata kurdî.

Li ser destê kurdên Qafqasiya li ser astê neteweyî yekem hikûmeta autonomî hatiye avakirin û herwisa xizmetek bêhempa ya wan ji bo pêşxistina çand, ziman û zargotin, ferheng û edebiyeta kurdî heye û hêjayê ku yekem bingehên kurdlojiyê û kurdnasiyê li ser destê wan hatine tomar kirin.

Dema em behsa kurdên Qafqasiya yan jî “Sovyet” dikin, em behsa bi dehan akademsîyen, zanyar, nivîskar, hunermend, rojnamevan, zimanzan, siyasetmedar û rêveberên dewletê dikin, ku biqasî rêvebirina dewletek modern hene.

Helbet ji kurdên Sovyetê yên herî navdar û di rêza pêşîn de, pêdivî heye ku em behsa akademsîyon û cîgirê serrokkomarê Qazaxîstanê Prof. Dr. Kinyaz Îbrahîm Mîrozeyv bikin yê ku sala par ji ber nexweşiya koronayê di 8'ê tebaxa 2021'an de çû ber dîlovaniya xwedê, ku yek ji zanyar û lêderên herî berçav yên kurdên Sovyeta berê ye.

Mamê Kinyaz ku bi Apê Kinyaz di nav civaka kurdî de dihat binavkirin, tevî pîla wî ya zaniştî û edebî ya bilind wekî serokê zanîngeha Almatayê û herwisa wekî



cîgirê serrokkomarê Qazaxîstanê, lê zêdetir Mamê Kinyaz wekî serokê kurdên Sovyetîstanê dihat dîtin, ji bo rola wî ya mezin ji bo rêkxistin û damezrandina yekem federasyona navneteweyî ya kurdên diasporayê, ku îro li ser wê yekê çend komele û federasyonên revenda kurdî li diaspora û welatên Ewropa, Amerîka û Rûsya tene avakirin.

Li roja 06.06.2021 li bajarê koln li Almaniyê, şerefek mezin ji bo min bû, ku yekem car çavê min bi çavê Mamê Kinyaz ket, di wê çavpêketina wê Mamê Kinyaz behsa pêştgiriya xwe ji bo referandom û serbixwebûna kurdistanê kir û hewlên xwe yên dîplomasiyê ligel serrokkomarê Qazaxîstanê û berpirsên Rûsiya û tîkiliyên xwe ligel Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi taybetî ligel Serok Masûd Barzanî kir, herwisa behsa tîkiliyên xwe yên ligel berpirsên Rûsyayê kir yên ji bo rawestandina êrîş û dagîrkeriya Tirkîyê li ser Efrînê û paşî li ser Serêkaniyê û di nav de behsa hevdiîtina xwe ya bi cîgirê wezîrê derve yê Rûsyayê Mixayîl Bogdanof re kir.

Ji bo avakirina kesayetiya kurdî ya neteweyî girîngiyek mezin heye ji bo lêkolînek berferêh li ser bingehên zaniştî û dîrokî li ser kesayetiya Prof. Dr. Kinyaz Mîrzoyev û herwisa li ser kesayetiya bi dehan navdarên kurdên Qafqasiyê bêne kirin, ku pêdivî me heye bi aqilmendî û hişmendiya kesên wekî wan ji bo pêşxistin, yekxistina civaka kurdî û bihêzkirina bîr û hişmendiya neteweyî ji bo dewletbûn û serxwebûna kurdistanê.



## Ji Rojhilatê revî bo Rojavayê



N: Vênûs Fayîq

W: Hesên Mukerem

وَإِذْ قَالَ رَبُّكَ لِلْمَلَائِكَةِ إِنِّي جَاعِلٌ فِي الْأَرْضِ خَلِيفَةً قَالُوا أَتَجْعَلُ فِيهَا مَنْ يُفْسِدُ فِيهَا وَيَسْفِكُ الدِّمَاءَ وَنَحْنُ نُسَبِّحُ بِحَمْدِكَ وَنُقَدِّسُ لَكَ قَالَ إِنِّي أَعْلَمُ مَا لَا تَعْلَمُونَ ” البقرة: 31

Eva dyalogeke di navbera Xweda û melayîkeyan de, dema ku Xwedayê mezin ji wan re dibêje ku li ser erdê xelîfeyek hatiye danîn, mebesta wî hemer mirov e.

Di bersivê de ew jî dibêjin wana dikî bi xelîfe ku xerabkariyan encam didin û xwînê dirêjin, em jî hemd û tesbîhan li ser navê te dibêjin û ji te pîroz dikin, Xwedayê mezin jî di bersiva wan de dibêje ya ku ez dizanim hûn nizanin.

Lê mixabin, mirovahî her di dema ku Qabîl, Habîlê birayê xwe dîkuje, şahîdî dirinde bûna mirov û hebûna meyla bi xwînê jî û hewisa ya ku melayîke jê ditirsiyan hate gorê.

Li cîhanê de piraniya tawa-



nên kuştinan li ser navê ayîn in. Ya ku ev bangeşeyê jê re dikin mîrên olî û melan e. Ji vê dema ku tev cîhan bangeşeyê bo bihevre jiyankirin û yektir erê kirin, nû bi nû mîrên ayînî, civakê li ser îmandar û bê îmandaran de parve dikin.

Di vê dema ku rewşenbîrek ku tenê çeka wî pênûsa wî ye û bangeşeyê bona mirovkirina felsefeya xwandin û perwerdehiyê dike, tu pê hêrs dibî û xwînrijandina wî helal an rewa dikî.

Li Ewropayê xwandingeh heye ku taybet bi bawermendên mesebên weke Pirotoştan û Kirîştîyanin û herwisa piraniya bawermendên olên din lê, bo her xwandevanekî li ser her meseb û olek din de vekirîye çimkî, ev tev dersên mirovahiyê pêşkêşî xwandekaran dikin ku li xwandingehên din de encam didin.

Tenê cudahiya ku min dîtibe dua xwandina wan e li dema xwarina zarokan de, bona vê ku ev duayên han jî, nebin bi çavkaniyên bêzarî û nerizayetiya ti kesî û tev hêvîbirina bi Xwedayê bona vê ku xelk saxlem bin û bi tendrustî û aştiyane bijîn. Netên bi yasa belkî, weke mirov baweriya wan bi tev rengan hene û bangeşeyê bo jiyanekê kêrhatî a mirov bo tev mirovan dikin.

Îca li Rojava roj drengtir hil dê û drengtir jî ava dibe, derengtir haydarê nûçeyan dibin, berewajî li Rojhilatê ku roj zûtir hil dê, kiçî ev gelek zêde ji me zûtir haydarê wan pirsan bûne û bingeha bihevre jiyankirina kêrhatî bo mirovan ava kirin e.

Ev rojhilata jî ku zûtir roj vir hil dê, û cîhan ronahî dibe û herwisa piraniya wan jî mislman in, mezintirîn arîşeyên wan digel terorîştan hene, rojane hezaran kes li ser navê ayînên kuştin, heta nîrxên mirovan jî li pêş bangeşeyên cîhad û kuştinê de ne û ti nîrxek nemaye û zûrtirîn hejmar hejarî û bê dahatî vir da ye.

Li Rojava desthilatên partîyan û ayîn ku li dewletê cuda kirine, û digel yasay

## Şêrko Minberî, Zaniyar Minberî û Siyamek Areng” bi danîna barimteyê hatin azadkirin

**R**oja Yekşemî 11`ê Bane-merê, sê welatîyên binçavkirî ên bi navên “Şêrko Minberî, Zaniyar Minberî û Siyamek Areng” xelkê gundê “Niyer” a girêdayê bajarê Sineyê bi danîna barimteyê ji girtîgeha wî bajarî hatin azadkirin.

Ew sê welatîyên Kurd her yek ji wan bi danîna barimteya biqasî 800 milyon Tumenî bi awayek demkî heta dema bi dawîhatina heyama dadgehê ji girtîgeha bajarê Sineyê hatin azadkirin.

Roja Yekşemî 19`ê Befran-

bara sala 1400`an a rojî, Şêrko Minberî piştî gazîkirina bo îdareya Îtîla`ata bajarê Sineyê hatibû binçavkirin.

Roja Pêncşemî 9`ê Bane-mera sala 1400`an a rojî, ew welatîyê Kurd, bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û roja Şemî 6`ê Xer-manana sala 1400`an a rojî bi danîna barimteyê bi awayek demkî ji girtîgeha bajarê Sineyê hatibû azadkirin.

Herwisa sibêdeha roja Yekşemî 23`ê Xezelwera sala 1400`an, Zaniyar Minberî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî



ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û Siyamek Areng jî, sibêdeha roja Yekşemî 14`ê Sermaweza sala 1400`an a rojî, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin.

Ew sê welatîyên Kurd piştî bi dawîhatina heyama lêpîrsînê, ji girtîgeha îdareya Îtîla`ata bajarê Sineyê bo girtîgeha wî bajarî hatibûne veguhaştin û di heyama binçavkirinê de, ji mafê “destpêregihîştina bi parêzer” û “hevdîtin digel malbatên xwe” hatibûne bîparkirin.

Heta niha ji sedema ww û tohmata ku li dijî wan sê welatîyan hatiye sepandin ti zanyariyek ber dest nîne.

## Seyran Mehmûdpûr: “Di nav her şoreşeke azadîxwazane û netewiyane de, eger jin beşdar nebe, ev şoreşa tevav nîne.”

Min li ser rewşa jin û keçên di nav şoreşê de hevpeyvînek digel seyran Mehmûdpûr Kadra Hêza Pêşmerge kurdistanê hevpeyvînek pêk anî û wê di beşek ji hevpeyvînê de daye zanîn: “Di nav her şoreşeke azadîxwazane û netewiyane de, eger jin beşdar nebe, ev şoreşa tevav nîne.”

**Hevpeyvîn: Hesên Mukerem**

**P:** Berî her tiştî xwe ji me re bide naskirin?

**B:** Navê min Seyran Mehmûdpûr e û ez 26 salan berî niha li bajarê Pîranşarê jidayîk bûme û ev zêdeyî 4 salan e ku şanaziya tevlîbûna di nav refên Hêza Pêşmerge Kurdistan û têkoşerên Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bûye nesîbê min.

**P:** Çawan bûn ku te biryar standin ku tevlî refên Hêza Pêşmerge Kurdistanê bûyî?

**B:** Ji ber vê ku malbata min li herêmeke de jiyan kirine ku bi awayek berdeham hebûna pêşmerhgeyan vir bûye û herwisa cexesta û berxwedaniya ciwanên Demokrat hebûye û behsên pêşmergebûnê min dibihîst û her li zarokatiya xwe de ez hogirê pêşmerge û armanca pêşmergan bûm.

Herçend ku zlim û zêdexwaziya rejîma xwînmij a Îslamî li hember gelê Kurd li rojhilatê Kurdistanê de û herwisa bitaybet havêtina qeraxê a jinan jî, tev sebeb bûn bo ku dibe weke kiçeke Kurd helwet û karek bo neteweya xwe encam dabe û herwisa piştî jî baştirîn û goncavtîin kar jî wisa bizanim ev bo ku bibim bi pêşmerge.

**P:** Hevala Seyîran hûn jiyanê Pêşmergeyê çawa dinrxînin?

**B:** Jiyanê pêşmergeyê, jiyanêke pir bi serbilindiye ku dibe bo her kesî rêk nekeve

an jî deşt nede yan jî her kes



nekare vê jiyana serbilind û cihê şanaziye derbas bike.

Lê, di vê jiyana de ders û koma ezmûnên gelek binirx deşt xwe ve tînî.

Ji bo mînak ez kiçekim ku min bawerî bi xwebûn û xwe dîtîne di nav kar û xebatê, birêve berî, bawerî hebûn bi şîyan û behreyên kiçînî a xwe û tev bandorên jiyana pêşmergeyê heye.

Min li jiyana pêşmergeyê de kariye weke jinekê xwe bibînim û bi bê ti cudahiyeke û ev raştîya jî derxistîye ku ev jî eve ku em jî weke jin dikarin bandoradar bin û rolê bilîsin û herwisa di jiyana pêşmergeyê de serkevtî bin.

Li hûndirî xwe de wisa dizanim ku eger ez li rojhilatê bimama û weke xortekî azad bijyama, hêsta jî min nedikarî bi wî awayî ku di nav Hizbê de xwe dîtiye rola xwe bilîsim. Hevdem jiyana pêşmergeyê ez hînî jiyana diruşt û serbestiyane kirime.

Ez gelek kêfxweşim ku min şiyaye di nav şoreşa rewşa

ya gelê xwe de çekê bi-havêjim milê xwe û bibim bi pêşmerge Kurdistanê û berevaniyê ji nîştimana xwe bikim.

**P:** Rola jinê dinav şoreşê de çawan dibînin?

**B:** Di nav her şoreşeke azadîxwazane û netewiyane de, eger jin beşdar nebe, ev şoreşa tewav nîne, wate kêmasiyek mezin li hûndirî de heye û li ser nakeve.

Ji ber ku zilm û zordariyên bêsînûr di nav civakan de li dijî jinê tên encam dan.

Ji ber ku ev zilçm û zordariya ku dinav civakan de heye jinê jî ji xwe digire, û her bi vê sedemê de ye ku dibe ev jî beşdar bin.

Jin dikarin hem di çepera xebat û berxwedaniyê de mil bi milê bira û hevçeperên pêşmerge ên xwe xebatê bimeşînin û hem jî, dikarin bêjim ku hewce nake jin hetmen dibe li çepera herî pêş a şer de bin.

Her ya ku bira, bav û hevjinê wan li çepera şer de, jin jî

serpereştîkirina malbatê li ser milê wan e, an jî li nexweşxaneyan de karên çareserkirina nexweş û birîndarana encamp didin an ku di vê dawiyê de jinan bi lidarixstina meşan û endambûna li NGO yan de kar dikin bo mînak Zara Mihemmedî çiqas rolek baş di şoreşê de hebûye. Îca ji ber hindê ye ku jin hem dikare li çeperên şer de rola xwe bilîse û hem jî li cihê xwe de rola xwe bo şoreşê bilîsin.

**P:** We weke pêşmergeyek çî heye bo ciwanên Kurdistanê?

**B:** Ez weke pêşmergeyeke Hêza Pêşmerge Kurdistanê, ji ciwanên Rojhilatê Kurdistanê daxwaz nakim li hûndirî xwe de guherînkariyan pêk bînin ji ber vê ku bi kêfxweşî ve niha ciwanên Rojhilatê gelek jîr û têgihîştî li hember rewş û şert û mercên Îran û Rojhilatê de.

Her ku meşan lidar dixînin, li rêxistîna û saziyan de çalak û çeleng in, weke jîngehparêzî an dersên Kurdî fêr bibin yan jî hemûyan girîntir niha ciwanên Kurd deşte bi deşt çî kiç û çî jî xort tevlî refên Pêşmerge Partiya têkoşerên dibin, ev bixwe nîşana hişyariya siyasî û guherînkariyên neteweyî ne di nav ciwanên Rojhilatê Kurdistanê de.

Ez spas û pêzanîne ji tev ciwanên wiha têgihîştî re dibêjim ku hewla bideştveanîna azadî û mafê neteweya xwe didin.

Daxwazê ji wan ciwanan dikim ku bi her awayî xwe ji di vê xebatê de bê par kirine hewl bidin vir şûnda xwe di vê xebata pîroza neteweyî de bibînin.

Spas bo vê derfeta ku we da bi min da ku bikarim di vê hejmara rojnameya we de parek hebe û herwisa bikarim haştên xwe bînim ziman serkeftin û serbilindiye bo gelê bideştê Kurd dixwazim, bi hêviya serkevtina xebata neteweyî a gelê Kurd.



## Binpêkariyên mafê mirovî di Kurdistanê de

### Rehmetullah Salihyan” bi danîna barimteyê ji girtîgeha bajarê Sineyê hate azadkirin

Roja Duşemî 12`ê Banemerê, welatiyekî Kurd ê bi navê “Rehmetullah Salihyan Yazîbilaxî” xelkê gundê “Yazîbilaxî” yê girêdayê bajarê Seqizê bi danîna barimteyê ji girtîgeha bajarê Sineyê hate azadkirin.

Ew welatiyê Kurd bi danîna barimteyê bi awayekî demkî heta dema dadgehîkirinê hatiye azadkirin.

“Rehmetullah Salihyan” di heyama binçavkirinê de ji mafê “deştê ragihîştin bi parêzer û hevîtin digel malbata xwe” hatibû bêparkirin.

Roja Çarşemî 27`ê Rêbendana sala 1400`an a Rojî, ew welatiye ji girtîgeha îdareya Îtîla`ata bajarê Sineyê, bo girtîgeha navendî ya wî bajarî hatibû veguhaştin.

Roja Yekşemî 14`ê Sermaweza sala 1400`an a Rojî, “Rehmetullah Salihyan” bi bê hebûna ti belgeyên yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û bo lêpîrsînê ji bo girtîgeha îdareya Îtîla`ata bajarê Sineyê hatibû veguhaştin.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wî welatiyê Kurd de hatiye sepandin ti zaniyariyek ber deşt nîne.

### Eskender Lutfî û Mesûd Nîkxwa deşt avêtine bi gireva birçîbûnê

“Eskender Lutfî û Mesûd Nîkxwa” ji endamên birêveberiya Encûmena Sinfî ya Mamoştayên Kurdistan-Merîwanê, li dema binçavkirinê de deşt avêtine bi gireva birçîbûnê.

Şevra Hevahengîkirinê ya Saziya Sinfî a Mamoştayên Îranê, tevî piştraştîkirina gireva birçîbûna “Eskender Lutfî û Mesûd Nîkxwa” ragihandiye ku: “Em hîvîdarî ew navenda ku ew herdu welatî binçavkîrine bi têgihîştin digel wê mijarê reftar bike û wan herdu welatiyan serbest berde.

Roja Yekşemî rêkevtî 11`ê Banemerê “Eskender Lutfî, Şe`iban Mihemedî û Mes`ûd Nîkxwa, ji endamên hey`eta birêveberiya Encûmena Sinfî ya Mamoştayên Kurdistan-Merîwan, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibûn binçavkirin û paşniveroya hemen rojê “Şe`iban Mihemedî” hatibû azadkirin.

### Du kolberên kurd li ser sînorê newsûdê hatin birîndarkirin

Sibêdeha roja Yekşemî 11`ê Banemerê, du kolberên Kurd ên bi navên “Umîd Hebîbî” temen 27 salî û “Zanko Xusrewî” temen 19 salî, xelkê bajarê Rewanserê bi sedema teqeya raşteraşt a hêzên leşkerî yê hikûmetê li ser sînorê Newsûdê hatin birîndarkirin.

Hêzên leşkerî yê hikûmetê bi bê agehdarkirina berê û ji mewdayeke nêzîk ve ew du kolberên Kurd dane ber teqeya raşteraşt a gulleyên xwe

Ew du kolber, ji aliyê ling û çokên xwe ve bi awayek dijwar birîndar bûne û bona tedawiyên pîzîşkî bo nexweşxaneyê bajarê Pawe hatine veguhaştin.

Li gor amara hatî tomarkirî ji navenda amarî ya “Kurdpa” yê, ji deştê pêka meha Gulana sala 2021`an a zayînî, heta deştê pêka vê mehê li sala 2022`an de, 251 kolber bi sedema teqeya raşteraşt a hêzên leşkerî ên hikûmeta Îranê, li ser sînorê Kurdistanê hatine kuştin û birîndarkirin.

### Kolberekî Kurd li ser sînorê Newsûdê hate birîndarkirin

Sibêdeha roja Şemî 10`ê Banemerê, kolberekî Kurd ê bi navê “Ferşîd Qadîrzade” xelkê gundê “Dişe” yê bajarê Paweyê, bi sedema teqeya hêzên Întizamî li ser sînorê Newsûdê, hate birîndarkirin.

Hêzên Întizamî bi gulleyên saçmeyî teqe ji wî kolberê Kurd kirin.

Ew kolberê temen 27 salî bi bê agehdarkirina berê li mewdayekî nêzîk de, ji aliyê hêzên Întizamî ve teqe jê hatiye kirin.

Ew kolbere bo tedawiya pîzîşkî bo nexweşxaneyê bajarê Paweyê hatiye veguhaştin û niha di bin neştergeriyê de ye.

Herwisa sibêdeha roja Şemî 10`ê Banemerê, kolberek bi navê “Sefer Subhanî” kurê Heyder, xelkê gundê “Dûrîsan” yê girêdayê bajarê Paweyê, bi sedema teqeya hêzên Întizamî yê hikûmetê canê xwe ji deşt dabû.

## Wêne: Semînra salvegera Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê

